Newroz Hejmar (73) Rûpel (14) Nîsan 2007z – 2619k

Rûdaweke biv e

Dîlan Zivigî

Ma kÎ nizane ku , zimanê dê nasinama mirovan, hebûna wan weke milet li pêş xelikên cîhanê diçespîne. Wisan jî , rêjîmên şoven û dîktetor dema lêdanê û setemkariya xwe li serê miletên bindest dikin ta ku , wan tarûmar û tune bikin . Ew ji berî her tiştî zmanê wan bi her reng û awî qedexe dikin , ew baş dizanin ku dema zimanê miletekî were pişafitin bi hêsanî ew winda û tune dibe . Weha jî zor girînge tu carî netê ji bîr kirin ku em kurd ji sedê salan ve bindest û neserbixwe ne .Lewre jî, pir pêwîste ku , em girigiya zimanê xwe yê xweş û şêrîn nas bikin û nirxa wî bilind hilidine jor , zar û zîçên xwe il ser riya bav û kalan bi evîna zimanê dê perwerde bikin , tu carî qenciya `wan rêzdar û pêzanên zimanê kurdî yên nemir, mîna Miqdad Bedir-xan , Celadet Bedir-xan , Dr. Nordîn Zaza , Osman Sebirî , Reşêdê kurd û H .w.d yên ku , bi salan xwe dane ser riya xebatê , ji zû ve destên xwe dane ser birînê, pir cefa û zehimetkêşî di warê parastina zimanê kurdî de dîtine . Bi dehan berhemên xwe, weke sermiyan ji me re hêştine ? Vêca jî, îro em tev deyindarê wan lehengan e .Pêwîste ku , em şîret û gotinên wan ji bîra nekin , hema weke nimûne û mînak ku , nemir Nordîn Zaza herdem digot : Eger win dixwezin tarûmar û winda nebin divê win zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin û eger win dixwezin xwe bi xelikên cîhanê bidin nasîn dîsan zimanê xwe bixwînin û bidine xwendin. Loman jî , pêwîste ku em bînin zimên . Bêgûman bi xêra van nemir û rewşenbîran e, em kurd îro li beşê sûriyê, ji rojên pêşîn ve û cara yekemîn partiyên tevgera me ya rêzanî nirxa zimanê kurdî zanîn û dan ser milên xwe ku, roj ji rojê vê rûdawê hewş vedaye , da îro zanayên me kurdan pir bûne , ew jî bi serbilindî li zimanê dê xwedî derketine û bi dehan kovar û rojiname hatine û têne çapkirin, nemaze parta yekîtî ya demoqrat a kurd li sûriyê ji sala -1991-an ve bi coşekî pir bilind di warê zimanê dê de xebitîne li bajarê Helebê û saya birêz Dr. Evdilmecîd Şêxo bi dehan mamostên zimanê kurdî ava kirine , pir koris ji bo xwendin û nivîsandina zimanê dê çêkirine , di kovar û rojnaman de beşdar bûne. Ne jî çiqas mixabin weke Heyder Omer li vê dawiyê dibêje!. Ligel vê jî, di roja me îro û di civaka me ya kurd de nemaze li bajarên mezin mîna Şam û Heleb rûdaweke bive heye , ku hin malbat hene çi xwe bi xwe bi hevdu re bi zimanê biyanî[Erebî] daxifin û zariyên xwe jî li ser wa riyê perwerde dikin , wan ji zimanê dê bi dûr dixin, qet nizanin ku bi vê awî hêvî û armancên dijmin û neyaran bi kar tînin ,ev li hêlekê û li hêla dî erik û stobariya xwe ji bîr dikin ku em tev di warê parastina zimanê kurdî yê hêja û şêrîn de berpirsiyar in, ta ku em li pêş nevî û nifişên nûgûha serbilind û xwedî rûmet dîyar bin ne jî rûreş û gunehkar bin.